TÎRÊJ Dîwana Helbestvan û Nivîskara
مجلس الادباء والمثقفين
www.tirej.info www.tirej.name

BAVÊ ŞÊRGO

# *AX JÎNÊ*

Helbest – 1 -

# Diyarî

Ji bo xatirê jiyaneke bê derd û kul, bê xem û jan, aza û serbest û ava, mîna bihişta bidil û ji dil, ez van helbestan diyarî dikim ta ku dil pê geş bibin û ji wan derdên ku di wan rûpelan de her azad û rizgar bibin .

Bavê Şêrgo

# Kurte jiyana min

**Navê min (Se'îd) – kurê – (Ûsiv) – kurê – (Hemo) – kurê – (Ehmede ) –**
**Di sala – 1966- an de li gundikê şêxê dîn – ez hatim rû dinê**
**Ez piçûkê çar bira û yek xuşkîme .**
**Min xwendin berdewamkir ta min – bekelorya – stand . dûvre ez du salan bûm mamoste di dibistana Zarokan de dûvre min du sala- sefxas-xwend lê min temam nekir piştî vê yekê min divabû ku xwendina xwe li Rosiya bersewamkim lê mixabin kû ji ber sedemê nexweşiya malxirab min ew jî temam nekir .**
**Dawî ez li Qamişlo bi cîbûm û li vir min dest bi saz û amedekirina helbestan kir ji mêjde bavê min çû ser dilovaniya xwe û her wekî sêwî bê war bi derd û kul rabûm .**
**Ev helbestên min tev derdibin jî ji nal û fîxan û derd û janê min mîna derdê welat jî û her win ji minre saxbin .**

**Sipas**

**Bavê Şêrgo**

# Wa kurda min

Êvara teb xêr wa kurda min
Rohnî bide evê şeva min
Tub tenê ew evîna min
Mij bîr meke ey hevala min
Ji bo te tê ev helbesta min

Carê guh bide delalê xwe
Rehmê bike ji wan çavê xwe
Bes tu bukje evîndarê xwe
J'dil tu bêje wan derdê xwe
Ez fîdakarê wan derdanim

Li dîwana te ez mest û jarim
Çilmisîme wek gula sarim
Lê gava tu biryarê didî
Wê çaxê ez dîn û harim
Lewma meke ez evîndarim

Tu geş gula baxê jîna min
Hilma te xweşe l'ber bîna min
Wêran dikin derd û kulê min
Carê tim bipirse l'halê min
Bê te na meşe gerdûna min

Wre carek rûne li ba min
Ji tere bêjim derd û kulê min
Vê hisretê derxe ji dil min
Ku ne tu bê kes nikarê min
Tiwî bilbila xem çaxê min



# Tim êêêê



Kurdistana min
Tev zozane….
Kanî û rûbar
Mêrg û çiyane

Îro dibin destên
dijmin de ew tim
bi qîr û girî
hawar û nalîn
axîn û şîne

j'ber dozê…ez herdem
dil b'ax… birînim ez
gih l'ser çiyanim ez
gih ez li ristan wek
bayên sibat harim

dozam j'bîr narî
kurdim timî ku dil
l'ser dil birîne

# Ez bûme

Ez bûme derwêş
Ez bûme evdal
Kevtim li ser zor
Rêçkên vê jînê
Min pir hilandin
Kul derd û hem…xem
Gul û kulîlk…tev
Çîçek û nesrîn
Man çilmisî tim
D'nêv dilde man sar
Ew j'ber ku dil ma
Her tim bê cî-war



## Li baxên dîlbera

Li baxên dîlberan
Min sor gulek dî
Çav ma melûl …lê
Lê bes hişyarkirim…kû
Tîrek li dil xist…
Dûr avêjtin derd
Û ew xemên dil
Zû dûr revandin
Min go erê dîlber
- min bihêle livir
bes tû bidem awir
bes tû xeman bukje
ma qey tu na tirsî
- ey-gawiram kû
Xem ta bibin j'dil



# Felek

Gerdûn li min pir
Fetlên xwe dan ta
Ez d'warê min de
Bindest kirim ta
Xerîb mam
Bê çar mam
Bê war mam
Felek dîse kenî
J'ber kû
Ez dil birîn mam



## Ax welat

Ax welat – ax
Kengî tê min
Xemê min
Bê sînor bikî
Ez westiyam
Ji dûrbûna te
Ji sarbûna te
Ji ahînên ta
Carekî
Min nedî
Dil geşiyan ta
Kû tû min wer girî
Min ji xwer bi hêlî
Wek welatan
Ax felekê
Bes tu jî bi kulke dil
Ew jî wek tev dilan
Divî tihna gul
Mane besin
Ji bo me
Ev derd û kul

# Çi dem bû


Bi xweş awazên bilbil
Ser mest dibin gul
Dilşad dibin ji dil
Ji bîr diçin derd û kul

Tixa liwan demên ciwan
Kû me derbaskirin tev
Bi dil xemî, bi gûman
Xelkê bitirxanî…
Bi dil geşî û ciwanî
Bûrandin buhara jiyan
Tîp û bahozê, li dil xist
Dil-ma- behitî
Dinêv tofana
Dinêv mij û dûmana
Sermê û seqem
Ji çendê demande
Cendekê bê war
Daye ber tîr û talan

# Tê bîra min

Xweş tê bîra min
Ew çax
Ew dem û dewran
Dema ez li gund bûm
Di hat çaxê xewê
Ez li ser textekî
Di hewşê de
Li ser livîna
Min cendek
Li ser piştê dirêj dikir
Li raserî min asîman
Bi tac û heyv û sitêrkan
Şev li hawîr dorî min
Li ber strêka Leyl û Mecnûn
Riya ka diza
Kursî
Û stêrkên pir dûr ji çavan
Çawe kû hêdî dirin
Li ber ên kû tîr didan

Ez dimam hişyar
Min şev bêrkek
Bi rist û raman
Bê xem û derd
Dibihûrand
Niha tê bîra min
Ev demê ez têde
Ji xwer di peyivim
Ax felek
Ta çi gerdûn
Li min gerand
Ta çi bi min kir
Çi ma-
Ji wa rojên naz û delal
Ta ez dûrkirim ?
Ta ku ez mam
Bê dev û ziman
Bê çar



# Rêça min dûre

Bûme derwêş
Bi erbane
Digirim hefsarên
Kerê xwe
Li ser ker
Arvanên ardî
Mirov tên ard didin min
Pêre didim
Pesnên xuda û pêxembera

Kolan bi kolan
Ez di gerim
Li rizqên (iyala)
Çav ma li dana xwedê
Li bendê wî ez ranazim


Tu kar îro naye ji min
Hêvya min

Her yezdanê mezin
Ji kesek din nakim gazin

Ev dunya me pir fenaye
Çav li rêça xudaye
Xwedê yezdanek dilovane
Her didî mafê mirovane

Bîr û bawerya min
Pir kûre
Rêka min
Riyek pir dûre
Barê yezdan
Barekî zore
Ez hildigirim
Bi dilê xwe

Giham ber deryê mirada
Mirad gihişt min
Çûme ziyaretê
Min da ber
Tobe û istxfara




# Ey Cûdî

Ey Cûdî
Carê tû serên xwe hilde
Hilde bihtir
Bila dijmin
Neghe bejn û balên te
Çendî tu ser bilndbî
Em jî bi tere
Hildibin jor
Lehengê ta
Hîn ji ta
Bilindtir dibin
Na tirsin ji berf
Û bahoza li ser ta
Lihimber dijmin
Min a stêrk û kelemin

Gava li Cûdî dinêrim
Kurdistan tê bîra min

Dil geş dibim
Ji xwer hêvî dibim :
Xwezî ey Cûdî
Li ser te jîna min ba
Wê çaxê
Mirin li ser min
Giringbû

Ji lewra
Dev ji min
Na berdin axîn
Ta navê min
Di dilde bû
Ev dilbirîn



# Ez û heyv

Ez û heyv
Hevalin
Li ber koma qirşan
Di şev bêrkên gunde
Ên havînî
Wilo çavêm di peyivîn
Ji rohniya heyvêre

Diya min :
Selik ji qirşan
Çêdkirin
Ez jî di kevtim
Xewnên xwe
Ê bi hişyarî
Û pêre pêre
Min helbestek :
Zaroktî saz

Û amede dikir

## Li ber bilûrê

Demê bûrî
Li kolana
Li sikaka
Li meydana malê
Min li bilûrê dida
Pêre pêre
Xem dicivîn
Şivana :
Pez li pala
Kom dikir
Gundiya tev
Zarok û can û kal
Birînên xo didrûtin
Û bi saza min re
Avên zelal
Ji kaniyan di meşîn

Hemû tişt
Di hat ji bîrkirin
Ji dil
Ne xasim
Ev kul û derd
Û bê xem
Ev xem
Direvîn

## Hûnga

Hînga ….
        Ez zarok bûm
Tenha
Ji xwer di leyizîm
Bi zorê
Min xwe diramand
Li ser tiştên jînê

a..niha…piştî
kû mi çil sal kir
ketim derên
bê dawî
ji kulare dibêjim
xwezî
ew zaroktî vegeryaba

ta kû
min ser dunya fenare
ne xwarba derd
yek raman û xem…!

## Ser Sîpan

Di xewnên xwede
Ên di hişyariyêde
Ez diçim
Li Sîpanê
Li warên Xecê
Ez melûl di gerim
De heşînkim
Evînya wan
Bi ristên çilmisî
Û mij û lya-xwe

Li wan dirûnim
Dibêm derdan
Min ew jî taxêvin

Bi çîrokên xwa
Hîn Siyabend birîndare
Hîn Xecê fîdakare
Hîn evîndarin
Ji xew hişyar dibim
Dîsa mixabin
Dibînim
Kû ev
Çi ware …!

## Cûdî

Cûdî…
Rondikek berfiye
Di herdû çavan de
Îro xwe
Hildikişînî…
Min nabînê
Û kûr li min diramînê
Wek ku carê
Lê ez kûr dibûm
Lê mijûl dibûm
Ro diçî ber ava
Dirahê jî helbestekî
Ji kesan di veşêrî
Bi azahî

Ji min re tavêjî
Kelegerma xwe
Li min dixî
Xerîbya min
Tam sar dikî
Cardî pê har dibim
Bi pênûs
Û xirxira mirinê li ser
Çêdikim helbestekî

## Xewnek

Li zozana
Peyvek…
        Rondikek…
Yan jî helbestek
        Min heye
Hûr û dûr
Kûr diçî
Bê sir û ceng
Û guh nade min
Di gel bayên
Dil difire….

Xewn û xeyala

Ji hîm û lat û zinar
Û gul û mergê va devera
Çêdikî
Xemên xwe
Davêjî
Pişt sînorên dilê xwe
Ta kû azadibî
Di xewnekî de
Û bi cih dibî
Ew…

## Ev çi jîne

Di nêrim
Li rewşa jînê
Di deryê wêde
Bê cî û qerar dibim
Baş-dibînim
Her tişt xuyaye
Meyzedikim
Li mirovatiyê
Dighim dawiya gotinê
Ko ev mirovanî
Wendaye
Hun dibînin
Bê însan çib serê…

Birayên xwe însan dikî
Talan dikî
Mal wêran dikî
Sêwî dikî
Bê xewn dikî
Çav melûl dikî
Lê belê
Çima-wisaye
Bo çi- bi armanca
Sitem û bê hişî
Ser germî
Û zor destî
Ew di meşî
Ma gelo
Ev cîhan
Têra mirovan nakî
Yan jî dive ew- bibî dojeh

Ma ne pak tire
Kû em bikin bihiştek
Ser firaz lê bijîn
Mem û Zîn
Ferhad û Şêrîn
Bi xemilin gulîstan
Keçê ciwan
Ji dil û can
Dil geş bibin zozan

Lê nizanim

Hê ez vê sirê
Ey jînê



# Çima Û

Çend salan
Mame li Rosiyayê
Çûme Mosko
Semara, astirxan
Pir bajar û gund mi-levdan
Mijûlbûm
Li ber ava
Volgayê
Çemek şîn û zelal
Fireh û dûr
Aza ji sînor û bumbe
Ji leşker

Li her derê welêt dirê
Pir aza di gerê
Hat bîra min
Dicle û Ferat
Gelo çima newisane !
Li ser wan mijû dûmane

Xanî û kolan
Gulîstanên rengîn
Jîn livir-ax
Bi çi rengî derbas dibî

Çi ma –
Welatên min
Wisa –
Bê renge
Û felek û cîhane
Bê jiyane
Çima …!?



## Dem çû

Demê çîrokê me çûn
Ey dilo
Çîroka min çû
Û nehat
Ey dilêm

Stêrkê xewnê min
Ji ber çavê min
Îro wendane
Ramanê min

Ma dihisreta
Kû xwe çawa
Dise hilweşîne !

Êdî der dikeve
Ji bin deryê
Bê jiyan
Kûr û tarî
Mîna zîndan
Ev dilê reben…
Dijî di zîndana cîhan
Cîhan li ser
Biryara zor û setem da
Hêdî bihêdî

Digerim ez li çarekî
Dûr jiyanekî
Li çirîskek hêvî
Li qûnaxek ronahî
Yan dibînim ez
Yan qet
Ez n-abînim



## Nakene

Çira şevbêrka min
Îro zû vemirî
Dostên kû
Li ber dilê min dirûniştin
Îro bê hişin
L'min xuyanabin
Çîrokê hêviyê min

L'ber pêlên xeman çûn
Nîrên jînê
Bi felekê re sozdan
Ez revandim wan
Avêjtim bê dawiyê
Îdî ji wê rojê pêde
Felek li min nebî xuya
Belê ey dil
Felek qet nakene
Bi gulên çilmisîre
Qet nakene

## Xwezî dotmam

Ji bextê minê sipî
Min dotmamek heye
L'ber kêleka mine
Navên wêjî Kurdistane
Bi vî navî
Pir şadibim

L'baskên wê siwarim
Em dibin yek
Difrin
Li hawîr Kurdistan
Di fitilin
Dirin liba
Evîndara
Hîn Xec û siyabend
Dijîn li wan wara
Evînya xwe dibêjin
Bê kul û xem
Duvre dirin liba
Mem û Zînê
Em têr nabin
Ji vê evînê
Em diçin :
Li ser çiya dilê xwe

Tijî dikin
Ji hêviya
Ji alyên-van lehenga
Em dinêrin
Kû bihara livir
Tim renge renge
Vê gavê
Ji xewnê hildibin

Ji xwer em dibêjin
Heft xwezî
Em hişyar neban



## Were dotmam

Were dotmam
Li ba min rûne
Tû bihûne
Ji min re
Van derdan
Dê bila

Neqşekî
Pir delalbî
Ew dilê minê dilovan
Dê bila ji dil
Li ser bê

Wer bêje min :
Çine axînê te
Bi dil germî
Ezê çêbkim
Tev hêviyên te

Divim kû tû
Li eywana min bî
Bi xeml û xêz
Li dîlana min bî
Bi çîrok û peyv
Li dîwana min bî

Ji tere
Bê tirs
Derêxim ji dil
Tev jan û xem
Tev derd û kul

Wer em binoşin Kurdistanê
Di dilande

Ne hêlin vê
Êş û janê

Ew Kurdistana didil
Tenha jiminre
Bûye :
Derd û kul



## Çima wisa dikin Û

Ez gul bûm
Li jînê vebûm
Zordara
Hêdî hêdî

Ava kaniya jîna min
Çikandin
Dara hewşa min
Ji qurm
Hilandin
Buhara min
Dimin kirin xewn
Ta ji minre bû hisret
Ew buhara ji dil

Çima wisa
Li jîna min dikin
Dinê li ber min reşdikin
Min ji warê min bar dikin
Xwînê dimijin
Min talan dikin
Bê hêvî dikin
Li zîndanê
Min werdikin
Min bê çaradikin- çima ?

## Kes tune

Jîna min
Li min
Bûye zîndanek
Tarî û kûr

Ez veqetyam
Ji hêviyan
Rê liber min
Pir dûr bûye

Têde diramînim
Dibînim kû çi jiyane
Ne bexte, ne ocdane
Tev bi fetl û dewrane

Gulên hêviya
Man çilmisî bê av
Çav ma
Li wan melûl

Ey jiyanê
Ka hevlatya te
Min jê fêm nekir tiştek

Derd û kula
Li min barkir barên xwe

Hingî ez bêjim
Tû bê olî
Hiskirina te zore

Ji minre dom nake
Lê tim bi dore

Dora te wê bê
Li min bi gerî
Çavên te
Wê korbin
Kes tune
Kû te êdî
Hilgirî

## Dunya

Dunya li min
Bû reş tarî

Ez kevtim
Vê zîndanê
Zîndana min
Tev ew cîhane
Kes bihalê
Min nizanê

Çavên reşî belek îro
Ji min mane dûrketî
Kes nizanê
Dilê reben
Çawe îro raketî

Rabe dil
Hişyar be j'xew
Pir wek ta
Hene evîndar
Çendî tû birîndarbî lo
Çendî tu bê war be jî
Li dinyayê tû namênî
Bê dost û yar

## Sirek ji çem

Min….
    Ji pêlên

Çemê tîj
Gûmanek
Zû kişand
Dichde
Û ji nişka
Pêlan
Li ber xwe
Ez birim
Ez avêjtim nêv
Gerên xo
Û bê hişkirim
Û piştî kû
Li dawiyê
Em gihane hev
Min jê pirsî :
Çima wisa bû
Go :
Ji ber kû
Sirê min
Bimînin biminre
Min tijî kir
Yek dilop

Ji xwîna xwe
Ji avên xwe
Ê xwînî

Ji nuh
Min fêm kir
Çima ev çem
Sirên xwe
Zû bi zû
Na bêjî ….



## Ey çemê tîj

Ey çemê tîj

Bêje min
Sirê vê …
Ne wek hevyate
Kû çiye
Bêje min …
Janê gûmanên ta
Wê bimînin
Ta kengî …
Rengê jiyana ta
Ta kengî
Wê bimênî
Divê cengê

Çima wisa
Pêlên ta
Bê hedanin
Gih germin
Gih sarin
Bêje min
Gelo ew jî bê warin !?

L'ber kevyên ta dirûnim
Çima ji min bigazin dî ?

Gazindên ta
Çima bê fîxanin ?
Gelo nalîna ta
Ji kûr tê
Ahîna ta

Çima –
Bê dawî tê

Bêje min
Ey çemê xemgîn
Çima tu mayî
Wek min
Ev dilbirîn



## Qozeqer

Qozeqerekî
Xwe li ser
Riwê min danî
Û ji nişkave
Xwe li nêv
Rûpelên …
Dilên min veşart
Go dixwazim
Xewnekî
Ji xewnên tey rast
Ji xwer bidizim
Û hilînim ….
Min jê pirskir çima
Ey Qozeqera rengîn

Tiştê kû dizanim
Tû xewna her kesî
Go belê raste
Ew çaxê
Ko bes der dikevim
Lê kû wendabim
Xelk min dicihde
Ji bîr dibin
Wek tev xewnan

## Ez çêdikim ji bo

Ji bo
Wan gulên
Ji demeke dûrde
Zuha mayîn
Û hîn
Ew bi hêvîne
Di bendî
Buhareke rengîn
Ku têde
Bi dev ken
Û bi rewşbin
Ez ji kezebê
Ji gurçika
Derdixim
Van helbestan

Ji bo zarokekî
Divî ew jî
Wek tev ê cîhan
Jînek bidil
Û livîn
Bi xewnan
Ê zaroktî
Derbas bikî …!

Ez ji xwîna – tî –
Çêdikim van

Helbestan

Ji bo kû
Felek
Nêhrînekî
Li xwa binêrî
Çerxa xwe
A-gêj
Bes li ser
Jîna bê jînan
Bi zîvrîne
Ez çêdikim
Ji keserên xwa
Van – helbestan –

# Ax dunyayê

Ax dinyayê
Çendî tû fenayî
Çima îro
Tub mere nayê

Xew nayê min
Tim hişyarim
Ji ber ta
Ez ketme belayê

Çima ji xelkêre
Tu rengînî
Gul nesrînî
Lê li ser min
Dikî cefa
Te ez dame
Vê seqem û bayê
Divim ez jî
Bi te şabim
Carek tenê bi ter bêm
Vê govend û semayê

# Ji derdan

Ji derdan
Ez valenebûm
Ji hisretan
Ji axîn û nalînan
Ez tujebûm
Tim
Ez dimeşim li vê jînê
Bê ser û hiş
Dirim li ser
Rêça dûr
Dil li ber xwe didî
Pir dixwê êş û elem
Da ji bo biçê
Vê dawiyê
Dawiya teng û zor
Li ber çavan
Pir xuyaye
Zor û setem
Derbend û kelem
Kela jînê li min dixî
Min davêjî
Xewn, xem û xeyalên
Çendê salan

Dibhûrê zeman

Cîhan namîne ew cîhan
Lewlebên dem dizîvirin
Ser min ….
Cardî ….
Venabê …
Ew mijû dûman
Feleka min
Bi min re
Tim bê ole
Ser min dikî dem û dewran
Wisa çav
Melûl dibin
Wenda dibin
Dinhêrînan dibin xeyal
Dimênin bê xwedî

# Xurebta jûnê

Di xurbeta cande
Ez dijîm
Bê semyan
Bê sewdan
Bê xwedî

Ji bin min
Ra dibî qad
Li ser min
Dicivî ezman

Bi canê xwe dizanim
Lê bes
Balê nadim
Li kîdê ew meyl dibî

Li çavên ta
Ez digerim
Ey jiyan
Çima wilo
Ji min re çilmisîne
Zuhane, miçin
Melûl û xemgînin

Divim ku ez jî
Xwe li warên ta
Ey jîna min :
Îro bidil nermî
Ez veşêrim
Ji ber ku dil
Ji tihna ta
Maye bê par
Ji ta gelek setem
Tirs xwar



# Dê bila

Dilopa dawî
Ji xwîna min valedibî
Ji çavên ta
Di şûşek camde
Hawîr jê tê
Bihna herdû
Hinarokên riwê ta
Camek tijî
Ji xemra giran
A ji lêvên ta

Nekuje raketna min
Ser cendekê xwe
Ez ta îro
Exsîrê wê neşweta
Ku tê
Ji herdû
Memkên ta

Dilê girêdayî
Bizincîra bala xwe
Êdî veke
De derkeve

Ji zîndana ta

## Çawa

Çawa tû
Dukje daxwazêt min
Ey mirovên ku tê
Ji sînorên din

Çawa tû
Axînê hêviyêt min
Dukje
Û di xwîna xwey harde
Di fetisîne
Bê ku tû
Binêre li olan xwe
Yan jî
Li wan daxwazê
Di hêviya canê
Mirovatiya xwde

Çawa tû
Pêl xewnê
Zarokên min dikî dojeh
Û bê dilovanî
Ma tû xewna
Ji bo zarokên xwe
Çawe pêktîne

Bivî dilî

# Ax dilê min

Ax dilê min
Dilê minê bi elem
Ta pir kişand
Ji vê dinê
Derd û kul û xem

Ez pir
Wêrokbûm
Li vê jînê
Lê çerxa malxirab
Ji min birin
Ev çax û dem

Sed wirdyan
Berdevên zîndana min
Rawestyane
Baş dizanin
Azadî
Mafak ji xwîna mine
Lê min nabin li cem
Lê ez bi xwe
Bi xwe behwerim
Li xwe pir dinerim

Ez dê rakim rojekî kelem

## Dû

Nefesin
Ji dû …
Pê …
    Bihitrî
    Wextên xwe
    Derbasdikim

Difitilim
Di zîvirim
Li dor serê xwe
Bi zorê …
Ev raman …
Min dişînin
Li ber xwe
Piştî kû xelasdibim
Ji helbestan xwe
Bi bingeh dibim
Derya hiş fireh dibe
Lê bes wek pêlekî …
Careke din
Hindik xwe dibînim
Û wenda dibim

Di cihde
Dinev lepê :
Kûrahiyek dinde
Bê hatin
Bê fedî
Û bê hêvî
Lev dikevim
Ev nefesên dû
Min li hev dicivînin
Lê bes
Vê carê
Bi gûman
Bi guş guş û elem

# Dilê min

Dilê min …
Dişewqa tede
Tim hişyare
Ey pêxemberê
Ummeta dilovan

Bi ronahiya ta
Bi dilovanya ta
Nav û dengê dilovaniyê
Giha seran serî cîhan

Tu rohniya
Di tarî şeva min de
Di zor jiyana min de
Tu xewna divim kû ji can
Ji xwer bihêlim

Ta jiyan tu jeker
Bibîna buhara xwe
Xwezî berî te çûbam
Rih û cendek
Ji bo te wêranbûban

Wê çaxê
Wê şabûban

Tû her dijî
Di fikrê min de
Di xewnê min de
Dixemê min de
Xeman didî alî
Jînê dixî bawerî

Çewqa bîranîna ta
Her careke kû li min dixî
Barê dinê
Ji bîr dibim
Bi tev titşê li ser
Zû davêjim ji ber wî
Derd û xem

# Dunyaye

Dunya fenaye
Bi mere qet nayê
Ji kerbê te ey welat
Ez her d'kevim tayê
Bê te tu caran
Ev sebra min nayê

Dunya derewîne
Bi xap û fene
Ji kesan re buhare
Ji mere
Bê ken
Û xeme

Dunyake pir şaşe
J' xelkêre rast tê
J' mere wek kaşe
Em çidikin
Ew nabe haşe

Dunya kotek û zore
Ji mere miç û kore
Lê bidore
Ji vê xwîna min a sore

## Îsmayîlê min

Erê Cûdî
Serî hilda
Dizanim tû
Tû bi xwe behwerî
Lê belê
Bejna te pir bilinde
Min Îsmayîlên xwe
Di bejna tere dî
Rohnî didî her der
Eyn mîna findê
Pir hisret min ji ber
Îro sitandin
Ez têde kûrbûm
Min dî ew bixwe
Wek Kurdistanê
Şewqa xwe dixî
Çiyayên herî bilind
Zozanên dilbixem
Her rengîn dikî

Buharên welêt
Bilbil tevî xeman
Jêre dilîlîne
Di dilê min de
Bû mîna pêtekî
Her li dijî dijmin
Dûman û ar didî

Bû rêdûrek
Dirêça mede
Û bixwîna pîroz
Wî rê vekir
Ji tariyê re go
Her wirde
Li şûna te wê
Bibe ronahî

Bû gelawêjek
Ji mer nîşan û her
Xeber û mizgîn da
Ew gulên didilê min de
Mayîn çilmisî
Ji demê dûr de
Wî ji wan re
Îro reng da

# Dilopek

Dilopek
(( ji xwînê ))
        Hate xwarê
Li şûna wê
Gulek vebû
Cîhan
Binav û dengê xwe
Pê geşbû

Tenê …
Xwîna min
A kevnar
Ne bi awazan bê
Helbestên ji dil
Awazên bi kul
Ew tucarî
Zelal nabî

# Qêrînek tê min

Qêrînek ji
Dûr ve tê min
Jîna min
Dixî talan
Girî û ceng
Dojehek bê dergeh
Min çare tune
Jê aza û rizgar bin
Tê her
Ji nalîna birînên derdê min
Ji axînên kû
Heşîn bûyîn di salande
Ji kûrî tên
Çê dikin
Zora jiyanê
Li ser laşê min

Felek ez
Her hiştim
Didevên aşê xwede
Û hêrtim
Ji ser ta bin
Carek tenê
Ne go :
Ez çi dikim

## Ger sed


Ger sed Cigerxwîn
Ji me rabûban
Wê welat
Ne meşyaba
Bi vî rengî

Ruçik şiştin
Ji kevnarî
Ji dêmên bi zeng
Ji tirk û ecem
Rist azad kirin
Go bi hevre
Mekin berberî
Avêjtin derekê bin
Beg û axa
Û zordarî

Û yar nivîsand
Bi rengê orciwanî
Bi şox û şengî

Ey kurên kurd
Tû pir lehengî
Dizanî tû
Tuj kiyî

Binav û dengî
Divim kû tim
Li ser vê rê
Rêça Cegerxwîn
Bidî pesna
Di şer û cengî



# Yek carî

Ez ser rêça jîna
Dilxem meşîm û
Min ev rê qet carek
    - berneda qet
Ser mest dimînim
Bendî bayek
J' bayên kulên dil

Çibikim ku hîn ez
    Dûv jînekî, mam
Qet ew jiyan bo min
    Dostanî nekir qet
Û her wisa kû
Çerx zîvirî
Ser min de kes yek carî

## Ey quling

Lo lo qulingo
Dizanim kû
Rêka te dûre
Ez li bextê ta
Tû kul û birînê min
Mekî kûre
Ji ta bihêvîme
Min li baskakî
Bixwer bibî
Zozan û serheda
Li sîpanê
Dixwazim têrbim
Ji wê jiyanê

Ey quling
Çendî tu gerya li cîhanê
Li dinê
Ji bo dil xweşî
Ez jî wek ta
Dikim doza :
Ser firazî
Mij bîr meke ey quling
Ez bê
Per û çeng

## Ez û qehreman

Ez li ba wî
Civîm li alîkî xênî
Kenek dida min
Xunavek barî
Hênik barî
Got pir kul û derd
Me sînga gerdûnê çirand
Bi axînê dil
Û felsefê
Û welat
Nexasim welat
Pê em pir mijûl bûn
Û li ser rêça dûr

Çû û çû
Ji wê rojê de
Min bes-dî
Îro dizanim
Li gorstanê
Diramînê
Xwe nabînim
Carek rûnim li ba wî
Ji xewfa axînekî
Ax û axîn
Wê bibin yek
Didil de

## Ah ji bo hemed

Ew çi dar bû
Ji daran
Li gund
Ew belavbû

Darek sipîndarbû
Ser li jorbû
Pir bilind bû
Di hewşa mede
Wê şax vedan
Kenek li
Melû lya minda
Dil ji merqê xwere

Pir da xuya
Stêrkên herî winda
Hilbûn ji burcê
Hêdî hêdî
Ber bixewnên mive livîn
Şabûnek diminde civî
Min ji axîna kûr berda
Mixabin ji min
Îro wenda bû
Kenê wî
Wek xeyal

Hate bîra min
Min serek lê xist
Cardî ji dil
Di gorêde
Kenek veda
Vêcarê jî
Mi xwej bîrkir
Lê bes
Bê dil
Û dibin konê
Dawiya mal xirab de
Min ev çîroka xwe
Hişt didil de
Ta kû bes
Mi go ((ax ))

## Mala Hemo

Xort û keç
Pîr û kalên me
Tev dil birînin
Lê belê
Him dil ciwanin
Kulan davêjin
Di şahiyên xwe de
Mîna gulên
Buharên Kurdistanê
Rengê xeman
Ji mêlakê direvînin

Tev yek pelin
Ji darekî
Mîna Cûdî
Bi bejn û balin
Mîna dur û aqûtin
Bi xemlên xwe
Dil direvînin
Axînê kevnar
Ji lêvan diweşînin
Wek mey û şerbet
Min li dîlana dilên xwe
Ji dûr tênin
Di civînin

## Ê dûrêde

Horiya bihişta li banî tiwî
Êş û derdê divî canî tiwî
Şerbeta ji cama enoşerwanî
Stêra dibircê asîmanî tiwî
Xem û xeyalê ta tim ezim

Reger diber rêgerê tede ezim
Ê rewza bûyî direwzên tede ezim
Rezvanê liber lêvên te ezim
Şervanê di cengê tede ezim
A birê java xwe weşandim tiwî

A renc êxiste hestî tiwî
Kehniya ava jiyanê tiwî
Ê dirêde kû bigehê
Ew her ezim

## Sêwî

Di gulîstana jînê de
Sêwî
Bê bav
Û her bimelûlî
Bi xemgîrî
Û dil bi kul
Hişyar bûm ez
Hin bi hin
Mîna gula
Bê av

A lê diçikî xunav
Mam bê jîn
Bê ronahî
Bextê min
Her bû dîwar
Tarî û kolanên bê mirov
Bê war
Bê xwedî
Helbest û awaz
Bûne zadê min
Min li xelkê dinerî
Çawe li ber
Şeveqa bava
Rû geş û livîn dibûn

Lê ez mam
Bê şeveq
Bê rû
Civîn
Bê heyv
Her û her
Di janê xwede
Tenha
Ez dimam
Û dimînim



# Ax ji dîlber

Sekranim ji cama
Li dest dîlber
Ew neşweta îlham
J'dev û lêva
Tim bê hedar
Tim kû têt̂e der
Me dil û can
Ku hembêz kir li ber
Hîn dîlber

Ji min pir didî keser
Balek ji zulfan
Ji wan dêman
Ew kû li min didî
Min di hêlî ta
Kû ji min
        Qet nayê xeber
Di êrîşan mîna
Pepûkim li hember
Çend salan min jê kire gazind
        Lê wê neda min yek sir

## Ey felek

Ey felek
Ma ji bo çi !?
Li dû te
Ez mam
Bê xwedî
Her jar
Her evîndar
Mi kir u nekir

Ev jîn
Min têr nedî
Bê gemî
Bê kelek
Tenha te ez avêjtim
Binê deryayên
Tev derd û xem
Hêvî ta şikandin
Gul çilmsandin
Xistim li çola
Bi êş û gûman
Ta neda min yek
Buhar ji dil
Her ma didil
Ta ji dil revand
Ew buhar

Ey felek
Ta kengî
Tê ser min bikî mij û dûman
Ta ji min ne berda
Ta ku leşkerên romiya
Zalimên contirk
Êrîş dane min
Bûne mîna xelek
Hatin lek bi lek

Ta ez kirim
Li kolan û sikakê jiyanê
Derwêşekî perêşan
Bê hiş û bê deng
Ma ne bese êdî
Ji derdê te
Ey felek

## CARNA

CARNA
Ji nişka
Buharek tê min
Dil serbest û
Serxweş dikî
Lê hîn dil

Dibe evîndar
Bê hilm û tîn
Wekî ar
…
Crana ji war
Hûr dibim …
Dûr dibim
Lê bil bilê mal xirab
Lal dibî
Ker dibî
Nade min
Vê carê jî
Rista ji dil
Çima ?
………

## Carek bi tenha

Min pir dilovanî kir
Ey jînê bes ta
Carek bi tenha
Dil xweş nekir carek
Her ser dilêm her

Xem barkirin her
-
Jîna mina sar
Bû wek kelem
Sînor li min her
Îro pêçan ta
Ez dûr kirim û her xerîb mam
Kû ez li rex war
-
Ez avêtim dûr
Min pir didî zor
Cîhan li min bû
Dojeh û her wek
Serma seqem, ez
Mam ber hêvî, çar
Bes min nedî carek
Yek çar ku ez ser
Jîn bibim ez

## Karê felek eve

Jîna mi tev bû
Talan û cengû
Barek giran û
Warek bi tirs ez
Kû ser dijîm

Çibikim felek her
Dor min venabî
Û her dibêm tû
Dizû bêbextî



## Her

Ma qey tu şerm ankî ji min ey felek qey
Carek ji xewr nakî
Tû van hisaba
Tû rabe carek

Qencî bi carek
Bo ên
Ên wek felek nabe

Mîna felek tû
Dewran bidî
Can û xeman
Her ev jiyan her
Ser tayên tebit her



## Gelo

Çavên mi ma tim
Ser rêça û der û
Ser van hêvî û
Aramancê dil bes

Yek xem, ji van xem
Kul û mereq, min
J'dil dernexistin
Pîrbûn dimin
Û jîn bihûrt, hîn
Ez bo dilên xo
Çêdikim hêvî hîn
Helbestê min ser
Jîna dilovan
Qet ew venabin
Çibkim lê ma her
Ev dil gelo ew
Her tim ciwan bit !

## EV RÊÇ

Ev rêç
Kanî û rûbar
Wek fikrê min her

Zû şîndibin her
Bes ez bê tirs her
Kûr têm pêlan ez
Ji dil davêjim ta
Cerg û hinav- ser
Min tim dinalin
….
Ev reç wekî min
Pir dûre bes
Wek min xwe na derxî
Ser barê pir zor
….

## Cardî

Vîna me kû her
Ser mem û zînbî

Çerxa felek tim
Ser dil wê razî

Bexçên gula kû
Em av nedin her
Bîna xwe nadî
Wek dem û dewranên bûrî

Ez baş dizanim kû
Ev jîn bê westan
Qet nameşî qet
Ez bawerim jî
Kû jîn mirov ser
J'dil kar nekî ew
Qet na meşî cardî

## Dê bese

Tû rind qeşenga

Baxên dilêm tim
Tû gewr û boza
Govendê min tim
Tû ew bihişta
Kû d' xewnê min tim
Tû tîn û bîna
Vîna rihêm tim
Wer rih bidem carek
Ez ketme nêv arek
Mij bîr dikir warek
Tev bo te yar tim
Ta şev bimin tim
Wenda dikir tim
Ji xew û xeyal tim
Loma li min bes
Tû bavêjî tim

## Ez mame xemgîn

Gul û binefş û
Nêrgiz û nisrîn
Rîhan û çîçek
Man çilmisî tim
Nav warê min
Min hisretek da
Xemla buhara
Xelk û alem
Min dî ji nişka
Kû ez bê parim
Him ez bê çarim
Ser dil ketim ez
Min da li ser dil
Fîxan û hem can
Min go çima ez
Îro dimînim
Her dil bi kul û
Cîhan li dor min
Dil xemrevîn, tim
Mam ker û xemgîn

# NAVEROK

- Diyarî ………………… 1
-kurte jiyana min 2
- Wa kurda min 3
- Tim 5
- Ez bûme 7
- Li bixabên dîlbera 8
- Felek 9
- Ax welat 10
- Çi dem bû 11
- Tê bîra min 12
- Rêça min dûre 14
- Ey Cûdî 16
- Ez û heyv 18
- Li ber bilûrê 19
- Hînga 20
- Ser Sîpan 21
- Cûdî 22
- Xewnek 23
- Ev çi jîne 24
- Çima 26
- Dem çû 28
- Na kene 30
- Xwezî dotmam 31
- Were dotmam 33
- Çima wisa dikin 35
- Kes tune 36
- Dunya 38

- Sirek ji çem 39
- Ey çemê tîj 41
- Qozeqer 43
- Ez çêdikim ji bo 44
- Ax dunyayê 46
- Ji derdan 47
- Xurbeta jînê 49
- Dê bila 51
- Çawa 52
- Ax dilê min 53
- Dû 54
- Dilê min 56
- Dunyaye 58
- Ismayîlê min 59
- Dilopek 61
- Qêrînek tê min 62
- Ger sed 63
- Yek carç 65
- Ey quling 66
- Ez û qehreman 67
- Ah ji bo hemed 68
- Mala Hemo 70
- Ê dirêde 71
- Sêwî 72
- Ax ji dîlber 74
- Ey felek 75
- Carna 77
- Carek bi tenha 78
- Karê felek 79

-Her 80
- Gelo 81
- Ev rêç 82
- Cardî 83
- Dê bese 84
- Ez mame xemgîn 85


www.tirej.info

******************
***************
*************
*********
*****
***
**
*